
# Frohe Weihnachten!



www.malvorlagen-bilder.de

## Bûyîna Îsa Mesîh

### Mizgîniya milyaket li ser bûyîna Îsa

26 Di meha şeşan de Xwedê Cibrayîl milyaket şande bajarekî
Celîlê, ku navê wî Nisret bû, 27 ba keçikekê ku dergistiya
mirovekî, navê wî Ûsiv bû. Ûsiv ji mala Dawid bû. Navê keçikê
jî Meryem bû. 28 Cibrayîl hat ba wê û jê re got: "Silav li te, ya
keçika ku qenciya Xwedê lê hatî kirin. Xudan* bi te re ye."
29 Meryem bi vê silavê şaş ma û fikirî, ka ev çi silav e? 30 Û
milyaket jê re got: "Ya Meryemê, netirse! Qenciya Xwedê li te
bûye. 31 De vêca va ye, tê bihemil bibî û tê kurekî bînî û navê
wî Îsa* deynî. 32 Ewê mezin be û wê jê re 'Kurê Yê Herî Bilind'
bê gotin. Û Xudan, Xwedê wê wî li ser textê* bavê wî Dawid
bide rûniştin. 33 Û ewê heta hetayê li ser mala* Aqûb padîşahiyê
bike û wê paşiya padîşahiya wî nebe." 34 Vêca Meryemê ji
milyaket re got: "Ma gelo evê çawa çêbibe? Çimkî tu mêr
nêzîkî min ne bûne." 35 Milyaket lê vegerand û got: "Ruhê*
Pîroz wê bê ser te û tê bikevî bin qudreta siha wî Yê Herî Bilind.
Ji ber vê yekê ew pîrozê* ku wê ji te biwelide, wê Kurê* Xwedê
jê re were gotin. 36 De vêca va ye, Êlîzabêt, ya ku mirova te ye,
ew jî bi vê pîrîtiya xwe ve bi kurekî biheml e. Ya ku heta niha
jê re digotin, ku ew zarokan nayêne, va ye ew di heyva xwe ya
şeşan de ye. 37 Çimkî tiştek li ber Xwedê zehmet nîn e."
38 Meryemê got: "Ez cêriya Xudan im. Bila wek ku te gotî, ji
min re bibe." Dûvre milyaket ji cem wê çû.

## Bûyîna Îsa Mesîh*

**2** Di wan rojan de Qeyser Awgûsto emir da, ku hemû xelkên
dinyayê navên xwe bidin nivîsandin. 2 Di wî çaxî de, gava
Kûrênyo serdarê Sûryayê bû, ev hijmartina pêşî bû, ku dihat
kirin. 3 Vêca herkes çû bajarê xwe, da ji bona xwe bide
nivîsandin. 4 Ûsiv jî ji bajarê Nisretê, yê ku dikete Celîlê, çû
Beytlehmê, bajarê Dawid li Cihûstanê, çimkî ew ji mala*
Dawid û ji bavikê wî bû. 5 Ew çû wê derê, da ji bona xwe bi
dergistiya xwe Meryemê re bide nivîsandin. Dergistiya wî jî
bihemil bû. 6 Gava ew li Beytlehmê bûn, çaxê welidandina wê
hat 7 û wê kurê xwe yî nixurî anî. Wê zaroka xwe di pêçekê de
pêça û di afirekî de danî, çimkî cihê wan li mêvanxanê ne bû.

## Şivan û Milyaket

8 De vêca li wê derê şivanan bi şev li çolê li ber keriyên xwe
nobe digirtin. 9 Milyaketekî Xudan* ji wan re xuya bû û rûmeta
Xudan hawîrdora wan kire ronahî. Ew gelek tirsiyan.
10 Milyaket ji wan re got: "Netirsin! Ez hatime, da ez mizgîniya
şabûneke gelekî mezin bidime we, ewê ji tevahiya milet re be.
11 Va ye, îro li bajarê Dawid xilaskarek ji we re welidiye. Ew jî
Xudan* Mesîh* e. 12 Bila ev ji we re bibe nîşan: Hûnê zarokeke
di pêçekê de pêçayî û di afirekî de razayî bibînin." 13 Ji nişkê
ve birek leşkerên ezmên bi milyaket re xuya bûn. Milyaketan
pesnê Xwedê dan û gotin: 14 "Di nav bilindayiyan de ji Xwedê
re rûmet û li ser erdê silamet di nav wan de, yên ku Xwedê ji
wan razî ye." 15 Çaxê milyaket ji dora wan hilkişîn ezmên,
şivanan ji hev re got: "Werin, em herin Beytlehmê, da em vî
tiştê qewimî, ewê ku Xudan bi me dayî zanîn, bibînin." 16 Vêca
ew bi lez çûn. Wan Meryem, Ûsiv û zaroka di afir de razayî
dîtin. 17 Gava ew dîtin, wan ew xebera ku li ser zarokê
bihîstibûn, bela kirin. 18 Heryekê ku ev xebera han ji şivanan
dibihîst, dima ecêbmayî. 19 Heçî Meryem bû, wê ev xeberên
han hemû di dilê xwe de dihiştin û kûr pê difikirî. 20 Piştre şivan
vegeriyan. Wek ji wan re hatibû gotin, ji bona tiştên dîtî û
bihîstî hemd ji Xwedê re dikirin û rûmet didan wî.